

Her Kurdek hewce ye bizane Êzîdîyatî çî ye

Bayram Ayaz; Elmanya *

Vê sernivîsê min bi zanatî dana. Belê, êdî gelek dizanin ku Êzîdîyatî ola xelkê/netewa Kurd ya herî kevn e. Cihê

keyfxweşiyê ye ku êdî piraniya Kurdan vê rastiya me ya dîrokî û kulturî hîn bûne. Lê ev ne bes e, qîma min bi xwe bi gotina piraniya Kurdan naye. Rastî ev e, lê divê em qîma xwe pê neynin. Hewce ye her Kurdek bizane Êzîdîyatî çî ye! Pêwîst e rewşenbiriya Kurdî baş têbigîhe, bê cîhê vê baweriyê û giringiya wê di pêvejoyên civakî û netewî ya Kurdan de çî ye û çî rola xwe hebûye û heye.

Çima bi ew qasî girîngî, ma tenê ola Kurdan Êzîdîyatîyê?

Dibe ku pirsek wisa were aqilê hinekan. Lê bersiva vê jî heye. Dema em girîngiyê didin Êzîdîyatîyê, nayê wê maneyê ku em bê rêzî li ol û baweriyên dîtir re nîşan didin. Na, em rastiya civaka xwe dizanin. Kurdên musulman hene, feleh hene, musevî hene û xwediyê baweriyên din jî di nav civaka me de tîn dîtin. Civaka me Kurdan jî wekî her civ-

akekî din fereh olî û fereh mezhebî ye, pîrr bawerîtî karaktereka me civakî ye. Hebûna ol û mezheb û baweriyên cuda rastiyeke kulturî û dîrokî ye. Êzîdîyatî bawerîya xelkê Kurd ya herî kevnare ye. Dema olên mezin derketine meydana dîrokê, evana bi heqî an bi neheqî di nav Kurdan de jî hatine pejirandin. Dînên mezin, evên xwedî bawerîya bi yek xweda, yanî musevîtî, mesîhîtî û musulmanîtî her sê jî li axa Rojhilata navîn peyda bûne. Xelkê Kurd li vê deverê jiyaye, xelkekî otontîk e, yani cîhwarbûyîyên herî kevnare yê herêmê ne. Ji hemî bûyerên serûbinker tesîr bûne. Pêgirên her olekî xwe gîhandine Kurdistanê jî û hinek Kurdan van bawerîyan pejirandine. Ev qewimînên dîrokî ne û li rewşfşa berê veeger êdî gelek zahmet e, heta ne mumkîn e. Ji bo vê yekê divê em pîrr baweriyê wek dewlemendiya me ya civakî, kulturî û dîrokî qebûl bikin. Ji cîhekî divê em dest pê bikin. Siyaseta pîrrengî û pîrrdengiya kulturî û civakî cîbecîh bikin. Ev jî dest pê kiriye. Tespîtkirin û birêvebirina siyasetên civakî kar û erkên dewletan in. Me heta nuha dewlet nebû. Îro me heye û cihê serbilindiyê ye. Dewleta me divê vê siyasetê bimeşîne. Û ev dibe jî.

Ji bo Êzîdîyatîyê divê prensîba dadwerî ya “cudahiya pozîtîf” bê bikaranîn. Yanî Êzîdîyatî bi taybetî û zêdetir were parastin, jê re derfet bê dayîn ku ev bawerî di nav civaka xwe de geş bibe û bikare xwe baş rabigihîne. Helbet ev tişt ji bo Kurdên musevî û mesîhî jî derbas dibe. Civaka

Kurd bi piranî musilman in. Piranî bûn berpirsiyariyên taybetî dide ser milê mirov. Kurdên musilman hewce ye zêde zêde qedrê xuşk û birayên xwe din bigrin û rê û dirba li pêş wan vekin. Em di destpêka prosesekî dîrokî de ne, dewletek û civakek damezirînin. Dewleta me divê demokrat û modern be, civaka me jî pirr reng, pirr deng û bi tolerans be, bi taybetî tehamulê yê xeynê xwe bike û herkes rêz li mafê herkesî bigre. Çarçoveya vê nêrînê ev e: Herkes bi baweriya xwe û li ser dînê xwe, herkes xwedî mafê xwe û azadiya xwe, herkes ji bo xwe û ji bo civaka xwe, ji bo xeynê xwe... Eger wisa be, wê demê em dê bikarin bibin pêşawayê prosesa nûjeniyê, modernizmê û demokrasiyê li Rojhilata navîn. Hêviya min ew e: ev paye bibe qismetê netewa Kurd, divê qirna 21.an de.

Berê ku em carek din vegerin sedemên mijara prensîba „cudahiya pozîtîf” ji bo Êzîdîyatîyê, dixwazim li gor bîr û baweriya xwe cihê baweriyê, ol û mezheban ronî bikim. Têgihîştina me û tarifa me ji bo nasnameyan hewce ye bi vê dorê be:

Ez mirov im. (genetics – hemî mirov wek hev in, ez jî yek ji wan im.)

Ez Kurd im. (ethnic - nasnameya etnîkî - xelk/netewe, ez tabihê xelkekî me.)

Ez Kurdîaxiv im. (language - Kurdiya şîrîn çekerê bîr û hizrê / kulturê û nasnameya netewî)

Ez xwedî çand û tore û edeba Kurdî me. (cultivation - culture - çanda gelî/netewî)

Ez niştecihê axa bav û kalanê xwe me. (homeland - Welatê min Kurdistan e.)

Ez ji filan êl/eşîr/malbatê me. (tribe/dynasty)

Ez xwedî baweriyek me. (belief / religion - Êzîdî me, Yahûdî me, Feleh im, Musilman im, min baweriyek dîtir heye an tune.)

Ez xwedî kar û pîşeyek taybetî me. (calling /profession - xebatkêrî û pîşe)

Ez xwedî bîr û hizra filan rengê siyasî me. (politics)

Ez endamê filan partî an rêxistinê me (organization / membership of ...).

Wekî em li jorî dibînin, berî ku em ser cudahiyên olî, an mezhebî ferqa xwe diyar bikin, berî wê bi kêmasî şeş heft kategoriyên me yên hevpişk hene ku ev kategorî bi hevudin re nasnameya netewî dikemilînin. Heta em dikarin ferq û cudahiya xwe ya olî bihêlin herî dawî û ya rast jî ev e. Lê pêwîst e em vê ferqa xwe jî biparêzin û rêzê lê bigrin. Kî bixwaze civakekî modern û demokrat ava bike mecbûr e, rêzê li ferq û cudahiyan bigre û nehêle zilm û tada li yekî were ji ber ferq û cudahiyan. Lê divê em yek bi yek û wek civak şiyar bin ku ferq û cudahî nebin bîr û hizra me ya esasî. Kî di ferq û cudahiyên olî û mezhebî de israr bike û hertim pê ve here, wê bide pêş her tîştî, metirsî heye ku bibe

fanatîk. Fanatîzm, korî ye, dijminahiya hêjayiyên mir-ovayetiye û demokrasiyê ye.

Li vê derê em dixwazin cudahiyeke piçûk bikin. Parastina Êzîdîyatîye pîrsek taybetî ye. Vê yekê divê mirov tê bigihe. Êzîdîyatî ne tenê baweriyeka Kurdan e, dibistana zimanê me Kurdiya şîrîn e. Dibistana çanda Kurdî ya herî kevnare ye. Zimanê Êzîdîyatîye Kurdî ye. Ev hejayîyek gelek gelek mezin e. Ez li vê derê naxwazim berferehî bi mijara ziman û netewê ve dakevim. Bi yek hevokê bêjim: Ziman çêkîroxê bîr û hizrê, hestê, çandê û netewê ye. Vêca ev qasî bes e ku mirov têbigîhe, bê ziman çî qasî girîng e. Zimanê Êzîdîyatîye bi hezar salan e Kurdî ye! Tenê ev rewşenbîriya Kurdî mecbûr dîke ku giringiyek zêde bidin Êzîdîyatîye. Çawa zimanê Tewratê Hebrî, zimanê Qurana pîroz Erebi ye, zimanê Êzîdîyatîye jî Kurdî ye. Zimanê Tewratê Hebrî (Îbranî) bû zimanê neteweyek bi navê Israîl. Xizmeta ku dinê îslamê û Qurana pîroz jî zimanê Erebi û netewetiya ereban re kiriye li ber çav e. Me jî baweriyek heye ku zimanê wê (pirtûka wê pîroz û dûayên wê û hemî tiştên wê) bi Kurdiya şîrîn e. Eger em vê rastiye nebin, mesele dibe wekî mirov tiliye di çavê xwe re bike, ronîya çavê xwe derêne!

Ez dê li vê derê çend mînak ji dîroka Elmanan bidim. Martin Luther serkêşê protestanan e. Di destpêka sedsala 16an (1522-1534) de Incîla pîroz wergerandiye Elmanî. Ev karê M. Luther di prosesa netewetiya Elmanan (german) de

bûyerek gelek mezin tê nirxwandin ji terefê ethnolingualist-an ve. Mînaka duyemîn, navê Elmanan ku ew li xwe dikin, Deutsch (Doyç tê xwendin) cara yekem di lorîkekê keşîşekî bi navê “Bischof Anno II von Koln” de derbas bûye. Navê lorîka keşîş “das Annolied” e. Alamanî ji zimanên Romanî tê, german jî ji Yewnanî û zimanên anglo-saksiyan der tê. Alaman bi alamanî ji xwe re dibêjin “Deutsch”. Navê zimanê wan jî „Deutsch an Deutsche Sprache“ tê gotin.

Vêca ev numûneya ku me ji dîroka Elmanan da bi serê xwe têrê dike, ku em fehm bikin, çima pêwist e em girîngiyê bidin Êzîdîyatîyê. Û çima, em divê berê xwe bidin Laliş û li wê derê lêgerîn û lêkolînên zimanî, kulturî, olî, binyatî (etnîkî û etnografîk) û sahayên din yê zanistiyê bikin. Parçeyek gelek girîng ji xezîneya dîroka me li wê derê û di nav Kurdên Êzîdî de veşartî ye, li benda lêgerînên zanistî ye. Ez ji bo vê yekê dibêjim, em mecbûr in, ji Êzîdîyatîyê re prensîba „cudahiya pozîtîf“ bi kar bînin.

Malpera we û navenda we xizmetên hêja dikin. Li gelê Kurd û Kurdistanê pîroz be. Xizmeta herî baş û berhemdar xizmeta bi dezgeh û bi metodên zanistî ye. Serkevtin ji bo karê we yên pîroz.

(*) **Bayram Ayaz**; nivîskar û siyasetvan, xelkê qeza Licê ser bi Amedê ve ye. Li Elmanya dijî